# ÇARÊKEK DI DOJEHÊ DE



*Nîzar Ormanî*

Wî rehendê pîvazî…
Dax didane pêkê min ê vala..
Baş daxkir,
Sor bû..
Min ,
Cigara xwe, pê berdayê..
Paş zer bû.. û
Kire rejî..
Ji dukêla cigara min,
Ewrek çê bû,
Baran barî,
Terij hate xwar û sema kir,
Cigara min, vemiriya û…
Bêhn jî…!
Dîwarekê çargoşe
Helweşiya û..
Nê bo herî..
Binkên, cigarên min
Li ser wê heriyê
Sucdek bo şûnwarên,
Roja pêncşembê bir,
Ta ku westiyan û..
Êk li dûf êkê
Mest bûy û hêdî vemirî.